**T. C.**
**Zanîngeha Mardin Artûklûyê**
**Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê**
**Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**
**Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez**

# JÎ ALÎYÊ USLÛB Û NAVÊROKÊ VE NÎRXANDÎNA MEWLÛDA MELA MUHAMMED EMÎNÊ HEYDERÎ

**MUZAFFER ERGİN**
**22721003**

**Şêwirmend**
**Dr. Şehmus KURT**

**Mêrdîn 2023**

# TAAHHÜTNAME

## TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisans Üstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum ''Ji Alîyê Uslûb û Navêrokê ve Nirxandina Mewlûda Mela Muhammed Eminê Heyderî" adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kâğıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye'de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylıyorum.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinde erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin ........yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

14.08.2023

Muzaffer ERGİN

## KABUL VE ONAY

Muzaffer ERGİN tarafından hazılanan ‘Ji Alîyê Uslûb û Navêrokê ve Nirxandina Mewlûda Mela Muhammed Eminê Heyderî‘ adındaki çalışma, Savunma Sınavı Tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, TEZSİZ YÜKSEK LİSANS PROJESİ olarak oy birliği/oy çokluğu ile kabul edilmiştir.

..........................................................................................................................................
..........................................................................................................................................
..........................................................................................................................................

# NAVEROK


**TAAHHÜTNAME** .......... i
**KABUL VE ONAY** .......... ii
**NAVEROK** .......... iii
**KURTE** .......... iv
**ÖZET** .......... v
**ABSTRACT** .......... vi
**DESTPÊK** .......... 1
**1. TÊGEHA MEWLÛDÊ** .......... 2
**2. JÎYAN Û BERHEMÊN MELA MUHAMMED EMÎNÊ HEYDERÎ** .......... 5
**2. 1. Kurtejiyana Wî** .......... 5
**2.2 Berhemên Wî** .......... 6
**2.2.1 Eqîda îmanê** .......... 6
**2.2.2 Mewlûda nebî** .......... 7
**2.2.3 Werdul etfâl** .......... 7
**2.2.4 Dîwan:** .......... 7
**2.2.5 Mevlidu'n-nebi (erebî)** .......... 7
**3. MEWLÛDA NEBÎ** .......... 7
**3.1 Derheqê Mewlûda Nebî** .......... 7
**3.1.1 Naveroka wê:** .......... 8
**3.2 ZIMANÊ MEWLÛDÊ** .......... 16
**3.3 Uslûba Mewlûdê** .......... 17
**3.1.1 Bikaranîna ayet, hedîs û riwayetên olî** .......... 19
**3.3.2 Hûnerên edebî yên mewlûdê** .......... 20
**ÇAVKANÎ** .......... 27

# JÎ ALÎYE USLÛB Û NAVÊROKÊ VE NÎRXANDÎNA MEWLÛDA MELA MUHAMMED EMÎNE HEYDERÎ

## KURTE

Di vê xebatê de behsa yekem mewlûda kurdî (kurmancî) Mewlûda Mele Muhammed Eminê Heyderî hatiye kirin. Mewlûda Heyderî di nav kurdan de gelek navdar e ku di medreseyan de piştî Qûr'anê zarok hînê mewlûda wî dibin û Ji bilî vê ev mewlûd di şîn û şahiyan de tê xwendin, ji ber vê di nav kurdan de berhemeke pir girîng e. Di vê mewlûdê de Heyderî gelo çawa pesnê Pêxember daye, şêwazeke çawa bi kar anîye, kîjan rê û rêbaz û hunerên edebî bi kar anîye, bi zimanekî çawa nivîsandiye em li dû bersiva van pirsan ketin. Di xebatê de ewil pênaseya peyva mewlûdê hat kirin û dû re der barê kevneşopiya mewlûdê, jiyan û berhemên Heyderî de agahî hatin dayîn. Naveroka mewlûdê çi ye, Heyderî çawa behsa Pêxember kiriye, rêbazeke çawa bi kar anîye em li ser van mijaran sekinîn.

**Peyvên sereke:** Mewlud, Mewluda Heyderi, Pesne pexember, Mele muhammed emin heyderî, Uslub, Mewluda Kurmanci

# ÖZET

Bu çalışmada Kürtçenin Kurmanci lehçesi ile yazılmış olan Molla Muhammed Emin el Heyderi'nin Mevlid-i Nebisi ele alınmıştır. Heyderi'nin Mevlidi Kürtler arasında ün kazanmış bir mevlit olup medreselerde Kuran-ı Kerimden sonra öğrencilere öğretilen ikinci temel eser olmuştur. Bunun dışında bu mevlit yaslarda ve düğün gibi eğlence merasimlerinde de okunarak icra edilir. Bu yönüyle Kürtler arasında önem kazanmıştır. Çalışmamızda Heyderinin Mevlidini birkaç yönüyle ele alarak değerlendirmek istedik. Örneğin Heyderi mevlidinde peygamber övgüsünü ele alış şekli nasıldır? Nasıl bir üslup kullanmıştır, hangi edebi sanatları kullanmış ve hangi yolu izlemiştir gibi soruları sorarak mevlidi bu yönleriyle inceledik. Çalışmamızda ilk olarak mevlit kavramına değindik ve kısa bir şekilde tarihçesinden bahsettik daha sonra müellifin hayatı ve eserlerine yer verdik son olarak mevlidin içeriği, üslubu yöntemi gibi konular üzerinde durarak çalışmamızı sonlandırdık.

**Anahtar Sözcükler:** Mevlit, Mewlûda Heyderî, Pesne pexember, Mele Muhammed Emin Heyderî, Mewlûda Kurmancî

# ABSTRACT

This study focuses on Mullah Muhammad Emin al Heyderi's Mawlid al-Nabiri, written in Kurmanji dialect of Kurdish. Heyderi's mawlid is a famous mawlid among Kurds and has become the second basic work taught to students in madrasas after the Holy Quran. In addition, this mawlid is also recited and performed during mourning and entertainment ceremonies such as weddings. In this respect, it has gained importance among Kurds. In our study, we wanted to evaluate Heyderi's Mawlid from several aspects. For example, how does Heyderi deal with the praise of the Prophet in his Mawlid? What kind of style did he use, which literary arts did he use and which path did he follow? In our study, we first touched on the concept of mawlid and briefly mentioned its history, then we included the life and works of the author, and finally we concluded our study by focusing on issues such as the content, style and method of the mawlid.

**Keywords:** Mawlid, Mullah Muhammed Emin Heyderi, Heyderi’s mawlid, Kurdish mawlid, Praising the Prophet, Uslub,

# DESTPÊK

Îslam li ser du bingehînen sereke ava buye yek Qûr'ana piroz ya din jî sunneta cenabe pexemberî ye. Bêyî van her du yan Îslam nayê fehmkirin. Quran gotinên Xwedaye, sunnet ji bi kurtasî jiyana cenabe pexemberê ye yanî gotin, kirin û tesdîqkirina wî ye. Hz. Mihemed qasidê Xwedê ye û ji bo mirovan hatiye şandin ku ji wan re bibe rêber. Mirovên ku bûne misilman û rêberiya wî qebûl kirine him bi ayetan, him jî bi sunet û hedîsan ve Hz. Mihemed şopandine û bi hezkirin pesnê wî dane. Mewlûd jî cureyêk edebîya ku li ser pesndana cenabê pexember ava bûye tê de hezkîrana pexember tê ziman. Kurd ji demekê pêş de bûne misliman û rêberîya wi qabul kirine, kurdan jî dest avetiye qelemê u hezkirina xwe ya pexember nivîsandine. Kurdan di qada mewlûde de gelek berhemen girîng derhistinê holê, Li gor agahiyên berdest di nav kurdan da kesê ku ewil ev cure berhem nivîsandiye Mela Huseynê Bateyî ye. Paşê hin kesên din çav dane wî û mewlûd nivîsandine ku me navê wan kesan û mewlûdên wan li jêrê rêz kir. Mela Muhammed Eminê Heyderî jî yek ji wane.

Di ve xêbata xwe de me ev mewlûda heja ya Heyderî ji hin aliyan ve nirxand. Gelo Heyderî mewlûdek çawa nivîsandiye, pesnê pêxember çawa daye… Li ser jiyan û berhemên wî gelek tişt hatinê gotin lê mewlûda wi bi avayekî berfireh hîn kesî lêkolin ne kiriye. Me jî xwest ku der bare ve berhema heja da hin lekolîn bikin û naverok, ziman û uslûba wi bi kurtasi peşkeşî xwineran bikin

# 1. TÊGEHA MEWLÛDÊ

Mewlûd peyveke erebî ye û koka wî ji tîpên “v, l, d” (و لد ) tê Ev peyva ku ji peyva “weladet”ê hatiye çêkirin tê çend meneyan ku yek ji wan “jidayikbûn” (Masdar), yek “cihê jidayikbûnê” (İsmi mekan) û ya din jî “dîroka jidayikbûnê” ye (İsmi zaman) ev meneya ferhengiye. Le ji wateya têgehî  dîroka jidayikbûna pêxember cihê dayikbûna wî, hatina wî ya dinyaye berhem u merasimên ku behsa bûna wî dikin tê fehm kirin[1].

Di mewlûdê de gelemperî behsa jidayikbûna pêxember (welâdet), pêxemberiya wî (risalet), jiyan û exlaqê wî, şerên ku kirine, mîrac, mucîzeyên wî, ji Mekkeyê çûyîna wî ya ber bi Medîneyê (hicret) û wefata wî (rihlet) tê kirin. Di nav gelek civakên misilman de mewlûd nivîsandin, xwendin û wek seremonî pîrozkirin ji berê va heye û wek kevneşopî dewam dike[2]

Li gor agahiyên berdest berhemên wek mewlûd tên hesibandin û pîrozkirina mewlûdê ewil di nav ereban de dest pê kiriye, paşê di nav civakên din ên misilman de belav bûye. Di alema îslamê da berhema ewil a wek mewlûd tê zanîn berhema Ebu’l-Ferec el-Cevzî ya bi nave “Mevlîdû’n-Nebî” ye. Piştî wê berhemên Ebu’l-Qasim es-Sebtî, Îbn Dîhye, Zemlakanî jî di nav mewlûdên ewil da dikarin bên nîşandan[3]

Di der barê ku merasimên mewlûde pêşî kengê derketiye de dû nêrînên cuda hene. Li gor nêrîna yekem cara  ewil dema Fatımîyan de li Mısırê ev merasîm çebûye. Li gor nêrîna duyem ji yekem kes ê ku merasîmên mewlûde çekiriye Muzafferüddin Kokborîye  û cih ji hewlêre. Sedema van her du nêrînên cuda ku derketine hole ev e ku merasimên giştî û merasimên ku tenê bi mezinên dewlete re dihatin piroz kirine.  Fatimîyan tenê bi mezinên dewlete re piroz dikirin lê merasimên giştî cara ewil di sala 1207an de hewlêre atabege selçukî Muzafferuddin Kökböri sererast kiriye mewlûd ji we deme heta niha di cihana İslamî de bi merasimên gişti te piroz kirin.

Kesên ku mewlûd nivîsandine yên erebî ji xwe re kirine jêderk û li gor van bi zimanê xwe yê dayikê mewlûd amade kirine. Di nav demê de mewlûd ji bilî nivîsandin û xwendinê, di salvegera jidayikbûna Hz. Pêxember de wek pîrozbahî, merasim û rîtûel jî hatiye pîrozkirin. Helbet çawa ku di nav gel û civakên din de mewlûd hatine nivîsandin, di nav kurdan de jî ev

[1] El Kitabı, Türk-İslam Edebiyatı, Grafiker yayınları, 2016, s.188
[2] Türkan Tosun, Usl’uba Pesnê Pêxember di Mewlûda Yekem a Kurdî de,, e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi, Aralık-2019 Cilt:11 Sayı:3 s.1508
[3] Süleyman Eroğlu, “Edebî Bir Tür Olarak Mevlitler-Şekil Özelliklerine Göre Bazı Değerlendirmeler”, U.Ü. Fen Edebiyat Fakültesi Dergisi 11/18 (2010): 126-127

berhem derketine holê. Qasî ku tê zanîn yekem mewlûda kurdî ji hêla Melayê Huseynê Bateyî ve di sedsala 17emîn de hatiye nivîsandin (lewra Bateyî di navbera sedsala 17-18emîn de jîyaye). Piştî Bateyî kesên din jî berhem dane û gelek mewlûdên din di edebiyata kurdî de cihê xwe girtine. Mewlûda Bateyî ya ku ji 600 beytan (ji ber destxetên cuda hejmara beytan diguhere) pêk tê ji bo mewlûdên din bûye jêderk û tesîra wê li ser mewlûdên din çêbûye Her çiqas piştî vê berhemê gelek mewlûd hatibin nivîsandin jî, qasî mewlûda Bateyî ew navdar nebûne û derneketine pêş. Piştî Bateyî hin mewlûdên kurdî yên ku hatine nivîsandin jê hinek ev in;

**Mewlûdên ku bi kurmancî hatine nivîsandin**

**Mewlûda Bateyî**: Mela Huseynê Bateyî

**Mewlîdî Nebî**:Şêx Muhemmed Emînê Heyderî

**Mewlûda Şerîf:** M. Zahit Kardeşlik

**Fêkiyê Narencî Mewlûda Kurmancî**: Ehmed Nas

**Mewlûda Şerîf:** Mela Muhemmed Elî Fudeylî

**Mewlûda Nebî**: Mela Şewqî Xak

**Mewlûda Pêxember:** Mela Silêman Kurşun

**Mewlûda Kurdî** Bi Şêwaza Hedbî: M. Burhan el-Hedbî

**Mewlûda Fexrê** ‘Alemê Muhemmed: Seyîd Mela Ebdurrehman Kurê Mela Hemze

**Ava Heyat**: Mela Elî bîn es-Seyid ‘Evdirrehman

**Mewlûda Şerîf Ji Ewwel Heta Axir Rêberê Xelasê**: M. Mustefa yê Mela ‘Aliyê Ezdarî

**Kitêba Dura Birîncî Mewlûda Kurmancî:** Mela Muhemmed Siraceddînê kurê Ebdilhekîmê Xelîlî

**Mewlûda Kurdî Bi Zimanê Gundî**: Seyîd Bedreddîn Ibn Mela Salih El-Hesenê Şefi’î El-Kefsurî

**Nezma Şerîn Der Mewlîd û Sîreta Resulê Emîn**: Mela Muhemmed kurê Mele Ehmedê Xursî

**Mewlûdên ku bi kirdkî (zazakî-dimilkî) hatine nivîsandin**

**Mewlidê Nebiyê Qûreyşî:** Ehmedê Xasê

**Biyîşê Pêxemberî**: Osman Efendiyo

**Babij Mewlîdî Pêyxemberî:** Mela Mehemed Elî Hûnî

**Mewlîdî Nebî:** Mela Kamilê Puexî

**Mewlîdî Zazakî:** Mela Mehemedê Muradan

**Mewlûdên bi soranî-hewramî hatine nivîsandin**

**Mewlûdname:** Şêx Huseyn Qazî

**Mewlûda Pîremêrd:** Pîremêrd

**Mewlûd**: Mehemed Emîn Beledî Şinewî

**Mewlûd**: Mamosta Mehemed Qadî Xidrî Eşnewîye

**Mewlûd**: Mamosta mela 'Ebdulkerîm Muderrîs

**Mewlûd**: Mamosta Mela 'Umer Nûrbextî Neqde

**Mewlûd:** Mamosta Celî Zade

**Mewlûd**: Kak Ehmed Muftîzade

**Mewlûda Mûfessel**: Mamosta Mela Hadî Efxemzade

**Mewlûda Muxteser**: Mamosta Mela Hadî Efxemzade

**Mewlûdname ê Kûkerdnewe**: Mamosta Mela Muhemedê Şelmaşî

**Mewlûdnamew Pêxemberî**: Şêx Nesîm Texteyî

**Mewlûd**: Mamosta Rehman Huseyînzade

**Mewlûdnamey Kurdî**: Reşad Mehemmed Miftî

**Mewlûdname ê New Eser Ya Tarîxê Pexember:** Şêx Mûhemmed Xal

**Mewlûda Seyyid Muhemmed Şemsê Qureyşî:** Seyyid Muhemmed Behaeddîn Şems Qureyşî[4]

[4] Tosun, Usl'uba Pesnê Pêxember di Mewlûda Yekem a Kurdî de, s.1508-1509-1510

# 2. JÎYAN Û BERHEMÊN MELA MUHAMMED EMÎNÊ HEYDERÎ

## 2. 1. Kurtejiyana Wî

Mela Muhammed Emînê Heyderî alim û edîbekî hevçerx ê pir girîng e. Di sala 1927an de li gundeki Nisebine Kelehê (Kalecik) hatiya dinê. Bave wî alim û edîbê mezin Mela Ehmed Heyderî ye, dayika wî keça Mela Aliyê koçêr Sadiqa Xanim e. Eslê xwe ji eşîrêke Patnosê eşîra Asiyane. Di dema şerê cîhanê yekem de bave wî têkilî şer dibe û di şer de brindar dikeve piştî ku Rûsan ev herêm dagir kirin koçî Nisebinê dikin û li wir cîwar dibin. Mela Ehmed heyderî li Nisêbînê bi Sedîqa Xanim re dizewice û keçek û sê kurê wî çedibin yek ji van jî Mele Muhammed Emînê Heyderî ye.

Piştî şerê cîhanê yekem kriza aborî dest pê dike û di vê rewşê de bavê wî jî wefat dike. Him diminin feqir him jî êtîm. Bê kâr û bê mâl dimînin . Di koxê de jiyana xwe berdewam dikin. Dewlemendê gund her çikas bêjin Sediqa Xanim bila zarokên we li hemberi pere li cem wan kâr bikin jî Sedika Xanim vê qebûl nake û girîngîyê bêhtir dide ser xwendina zarokên xwe.

Piştî Qanûna  tevhîdî tedrîsatê xwendina zanyarîyên Îslamî kotek bû ye heta nepêkan dibe. Medrese hatine girtin û alim sirgûn bû ne. Sediqa Xanim çareseriyekê digera ku zarokên wê zanyarên Îslamî bixwînin. ji bo vê yekê jî Muhammed Emînê Heyderî hîn deh salî şiyand Sûrîyeyê ku li wir Medreseyan bixwîne. li Sûrîyeyê gundeki Qamışlo Girbawa dest bi medreseyê kir. Piştî demekê ku li vir xwend çû Xaznayê li cem Şex Ehmed el Xaznewi xwendina xwe qedand û ji Seydayê Molla Abdurrezzakê Heleli  îcazet stand. Serf,  Newh, Mantik, Fikih Hedîs , Ekaîd Tefsîr û gelek zanyarên  dî yê olî de pêş ket. Heyderî ji bili Kurdî , Erebî , Farisî u Tirkî jî baş dizani bu.

Piştî ku îcazet  stand demekê li Medreseya Xaznayê Mamostetîyê dike duvre diçe gundê xwe kelehê dest bi  melatiyê dike ji wir jî diçe bawernê û li wir cîwar dibe. Li bawernê vala namîne dersê dide zarokan. Di sala 1967an de îcazeta tesewûfê ji Şex Aladînê Xaznewî distine û li ser israra komek mirovên  ji gundekî Farqînê gundê Salikan diçe wir û medreseyekê ava dike. Derdorê bajar gelek kes tên sohbet û dersên  wî û di bin bandora wî de dimînin .

Mela Muhammed Emînê Heyderî bavê 15 zarokaye ji hevjina wî ya ewil 8 zarokên wî hene piştî wefata hevjina xwe  dîsa dizewice û 7 zarokê wî yê din çêdibin. 15 zarokên wî 8 kurin  7 jî keçin.

Heyderî di sala 2000an de dest bi ava kirina Camî û medreseyekê dike navê wê medreseyê wî bixwe lêkiriye navê wê kiriye Güzeltepe. lê hîn ava kirina wê dewam dikir sala 2003an 76 salî diçê ser dilovaniya xwe. Piştî wefata xwe gelek xwendevan û heskiriyên xwe û 5 berhemên heja hîştine[5]

## 2.2 Berhemên Wî

Pênc berhemên Heyderî di destê me de hene çar ji wan helbeskîne yek ji wan jî yani mewlûda Erebî pexşankî ye. Navê wan ev in:

1. Eqida îmanê (Kurdî)

2. Mevlidu'n-Nebi (Kurdî)

3. Mevlidu'n-Nebi (Erebî)

4. Verdu'l-Etfal (Kurdî)

5. Diwana Heyderî (Kurdî)

### 2.2.1 Eqîda îmanê

Nivîskar ev berhema xwe di navbera 1975-1980an de nivîsiye ji destpêk û heft beşan pêk tê. tê de 210 beyt hene eqîda îmanê kurdî hatiye nivîsandin. Mijarên berhemê ev in:

a) Bawerîya Xwedê

b) Bawerîya Melekan

c) Bawerîya Pirtûkên pîroz

ç) Bawerîya Pêxemberan

d) Taybetîyên Pêxemberê me

e) Elametê Qiyametê

f) Bawerîya Axiretê

g) Îstîgase

Heyderî ev mijar li gorî bawerîya mezhebê eşarî nivîsandîye. zimanê pirtûkê zelal e

[5] Halil Akçay, Son Dönem Tasavvuf Alimlerinden Muhammed Emin El Heyderi (Hayatı ve Eserleri), Kimlik, Kültür Ve Değişim sürecinde Osmanlîdan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu 6-8 Eylül 2012 Bingöl, s.392-393-394

### 2.2.2 Mewlûda nebî

Ji ber ku mijara xebata me eve em behsa naveroka wê li vir nakin.

### 2.2.3 Werdul etfâl

Heyderî ev pirtûk di sala 1987an de ji bo zarokan nivîsiye. Werdul etfal tê watêya ‘’Gula Zarokan’’. Berhem kurteyeke İlmihala Îslamêye, li gori mezhebê Şafiî nivîsandiye. Ji 204 beytan û 19 mijaran pêk tê. Behsa paqijîya bi avê dest pê dike û behsa mevtê (mirinê ) xalas dibe di dawîya berhemêde 5 beytên leborîna nivîskar û 4 beytên xwendekarekî wî navê wî Muhammed hene.

### 2.2.4 Dîwan:

Dîwana Heyderî ji 83 qesîdeyan pêk tê. Heyderî bi taybetî jîyana xwe ya tesewufî de peş ketiye. Ev aliyê wî yê manewî û qabiliyeta wî ya nezmê kiriye ku gelek qesîdeyên evinî û xwedan hikmet derkevin hole. Qesîdeyên wî di nav gel de hatine xwendin û jiber kirin wek minak qasîdeya wî ya ‘’Eyâ sâkî dikim hêvî şeraba ‘işkê zû bîne’’ ji aliyê gelek qesîdevanan ve hatiye dengdayîn. Ev berhem di bin serenava ‘’Dîwana Heyderî’’ de dîwana bavê wî mela Ehmed Heyderî jî lê zede kirine û di sala 2012an de li weşanxaneya Nûbîharê hatiye çapkirin.

### 2.2.5 Mevlidu'n-nebi (erebî)

Heyderî di sala 2000an de li ser daxwaza kurê Şex Ehmed el Xaznewî Şex Ebdulğani nivîsandiye. ji bilî na’teke 8 beyt hemû pexşankîye û bi zimanê erebi nivîsandiye .

Ji bilî dîwana wî ev her çar berhemên dî bi navê ‘’Tuhfetul Heyderî’’ cara peşî di sala 2005an de weşanxaneya Hivda, dawîyê jî di sala 2012an de ji aliye weşanxaneya Seyda de hatiye weşandin.[6]

# 3. MEWLÛDA NEBÎ

## 3.1 Derheqê Mewlûda Nebî

Heyderî mewlûda xwe di sala 1975an de di qandîla mewlûdê de şevekê de nivîsandiye. Heyderî di wê şevêde dest pê kiriye û disa di wê şevê de qedandîye. ev ji evina heyderi digel cenabe pexember têne ber çavan. Dema nû hatiye nivîsandin ji 313 beytan pêk dihat le dû re Heyderî gelek rîwayetên ne rast jê derxistiye û ev hejmar daketiye 200 beytan. lê dîsa niha ev

[6] Akçay, Son Dönem Tasavvuf Alimlerinden Muhammed Emin El Heyderi (Hayatı ve Eserleri) s.397-398-399

mewlûda ku di nava gelda tê xwendin ya ku ji 313 beytan pêk tê ye û weşanxaneya ‘’Ayfa basın’’ bi vi şiklî çap dike [7]

Mewlûda yekem ku bi zimanê kurdî hatiye nivisandin mewlûda Melaye Bateyî ji ber ku zimanê wê ne xwerû bu û ji aliyê gel ve bi temamî ne dihat fehm kirin Heyderî mewlûda xwe nivîsandiye. Ji ber ku zimanê Mewlûda Heyderî hêsantire li cem Mewlûda Bateyî Mewlûda Heyderî jî hatiye xwendin û tercih kirin Di Colemerg, Mêrdîn , Şirnex , Êlih, Sêrt û derdorê van bajara bêhtir di merasima de Mewlûda Heyderî hatiye tercih kirin.[8]

### 3.1.1 Naveroka wê:

Mewlûda Heyderî ji 9 beşan û 313 beytan pêk tê. Dema ku em li naveroka mewlûde dinêrin tê ditin ku hema hema wekî mewlûda Melayê Bateyî ye[9]

Lê ji aliyê mijaran ve ji mewlûda Bateyi sînordar e. Hin mijarên ku Bateyi mewlûdê de nivîsiye Heyderî behsa wan mijara nekirîyê. Heyderî dema ku mewlûd nivîsandiye beşên mewlûdê bi serenav nekirîye û neveqetandiye. Lê dema ku ew beş têne xwendin mirov fehm dike ku ew beş derheqê kîjan mijarê de ye û em dikarin li gori wê serenavê li beşan bikin. Berî ku em hurgilî naveroka mewlûdê binêrin em ê gelemperî beşan vekolîn bikin.

Weki me li jor jî goti bû mewlûd ji 9 beşan pêk tê hin ji van beşan kurt in hin normal û hin jî dirêj in. Beşa yekem ji 14 beytan, beşa duyem 31, beşa sêyem 34, beşa çarem 40, beşa pêncem 83, beşa şeşem 17, beşa hevtem 51, beşa heştem 12 û beşa nehem jî 31 beytan pêk tê. Beşa heri kin 12 û ya heri direj jî 83 beytin.

**Beşa yekem: Hemd û Münacat:**

Heyderî jî wekî hemu alimên misliman bi hemd kirina xwedê dest bi pirtuka xwe dike. Mewlûda Heyderî bi van beytan dest pê dike:

Em bidin hemd ê xwedê ey misliman

Daye me pêxemberê axir zeman [10]

---

[7] Akçay, Son Dönem Tasavvuf Alimlerinden Muhammed Emin El Heyderi (Hayatı ve Eserleri) s.398

[8] Mehmet Tıraşçı, Güneydoğu Ve Doğu Anadolu Çevresinde Arapça, Kürtçe, Zazaca Mevlidler ve Müzikal Olarak İcra ediliş Tarzları C.Ü. İlahiyat Fakültesi Dergisi 2013, Cilt: XVII, Sayı: 2, s.216

[9] Hayreddin Kızıl, Diyarbakır Ve Çevresinde Yazılımış Mevlitlerin Konularına Göre Tasnifi Denemesi, e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi -www.e-sarkiyat.com- ISSN: 1308-9633 Sayı: VII, Nisan 2012 s.121

[10] Mela Muhammed Eminê Heyderî, Mewlûda Nebi, Ayfa Basın, s.2

Ji bilî hemd kirina xwedê di vê Beşê de munacaat jî heye yanî , dia kirin. Alimên Îslamê berhemên xwe de xwestina ‘efu kirin û şefaata pêxember dikin. Heyderî jî bi vî şiklî beşa yekem ava kiriye

Ey xwedayê xalikê erd û sema

Tû nehelî ummeta ha der xema

Em gunahkar çav li ğufrana te ne

Hevîdarê rihim û îhsanê te ne [11]

Dîsa di vê Beşê de pesnê pêxember jî di de ku ew bibe xalasîya gunehan bi navekî din daxwaza şefaatê tê kirin.

Ey Muhammed ey resulê ins û cin

Xwedîyê tâc û beyraqa roja mezin

Mesneda vê umetê her tû yi

Derî ye fetha cenneta me her tû yi

Em bi cahê te xalas bin ey nebî

Ruhu canê me fedayî canê te bî[12]

**Beşa duyem: Xêra xwendina Mewlûde:**

Di vê beşê de behsa xêr û fazîletên xwendina mewlûdê hatiye kirin. Mevlûd û bikaranîna mewlûdê her çiqas piştî pêxember û sehabîyan derketibe jî Heyderî derheqê xêra xwendina mewlûdê de ji pêxember û hin sehabîyên mezin rîwayetan tîne, ji Ebû bekir, Umer, Usman û Elî hin rivayet neqil kiriye û teza xwe bi wan qewî kiriye. Heyderî di mewlûdê de rîwayetek ji pêxember bi vi şiklî neqil kiriye

Yek rîwayet go ji Muhammed hatiye

Qedrê mewlûda me yê ku girtiye

[11] Heyderî, Mewlûda Nebi s.2
[12] Heyderî, Mewlûda Nebi s.3

Hin pere masrûf kirin ber mewlûdê

Wek çîyakî zêr di xêre de dide[13]

Heman şiklî ji Ebubekir, Umer, Usman û Elî ji hin gotin neqil kiriye ji bo minakê em dikarin van beytan bidin

Got ‘umer mewlûdê ku kî taqdîr kiri

Wî ji xwe rê Îslametî ihya kirî

Goti Usman masrafa ber mewlûdê deyn

Wek tû çûyî xazweya bedir û huneyn[14]

Dîsa Heyderî ji aliman jî li ser xêra xwendina mewlûdê hin gotinan neqil dike û dibêje yê ku mewlûdê bixwîne ew kes û ew cih jî diz û dijminan afatî û belayan tên parastin û xwarina wê malê bereket dibe.

Xanîyê mewlûdê ku tê de xwandine

Tê hamandin ew ji diz û dijminan[15]

Ev rîwayetên ku ji pexember û çar xalifeyên râşîd neqil kirine têne rexne kirin. Ji ber ku mewlûd wekî me li jor jî got piştî dewra pêxember derketiye holê. Bi rastî tê gotin ku Heyderî hin beyt ji ber ku ne rastin ji mewlûda xwe derxistine dibe ku ev rîwayet jî ji wan bin

**Beşa sêyem: Afirandina Ronahîya Pêxember**:

Ev beş behsa afirandina ronahîya pêxember dike ku ew berî her tiştî hatiye afirandin. Xwedê hin ‘erş, ferş, kursî, qelem, lewh hwd. ne afirandibûn ronahiya Muhammed afirandîye.

Ewelê go xwedê îcat kirî

Wî ji nûra xwe Muhammed çêkirî[16]

Pêşî xwedê nûr afirand dû re xwedê ev nûr avêt behrê û hinek behr kelî ya kelî bû asîman ya bû kêf jî bû erd. Piştre ev ronahî kiriye çar perçe û ji van her perçeyan lewh, kursî qelem û erş afirand.

[13] Heyderî, Mewlûda Nebi s.3
[14] Heyderî, Mewlûda Nebi s.4
[15] Heyderî, Mewlûda Nebi s.4
[16] Heyderî, Mewlûda Nebi s.6

Şeqî nûra di xwedê çekirîye çar

Lewh û kursî qelem ‘erşê kîbar[17]

Piştî ku qelem hatiye afirandin. Xwedê emir dike ku pêşî la îlahe îllallah û di bin re Muhammed Resûlullah binivîse. Qelem dema ku navê mûhammed dibihîze serxoş dibe û dipirse ‘’dibêje ma ew kiye navê wî pir şêrine?’’ Xwedê bersiv dide dibêje: ‘’ger ew neba wê yek tişt jî neba’’ yanî sedema afirandina her tiştî Hz. Muhammede. Ev gotin nîşanî hadîsekê qudsî dike ku hadise de tê gotin ‘’lewlake lewlake lema xelektu eflake’’ wate yanî ger tû nebû ya felek û tiştê din jî wê nebana… em fehm dikin ku Heyderî işaret li vê hadisê kiriye..

**Beşa Çarem : Afirandina Adem:**

Wekî ku ji navê wê tê fehm kirin ev beş behsa afirandina mirovê ewil Adem dike.

Ferîşteyan çûn ji Xwedê xwestin ku Adem biafirîne, xwedê jî li nûra Muhammed nêrî û ji wê nûrê xwêdane dilop kirin. Dilopek ji xwêdanê ket ser axa Adem û bû herî, xwedê emîrê rih kir ku bikeve cesed. Piştî ku Adem zindî bû xwedê ji ferişteyan xwest ku ji wî re herin secde. Ji bilî şeytan hemû ferîştêyan secde kir. Xwedê ronahîya pêxember danî pişta wî. Hemû ferîşte li pişta Adem dibûn kom û li wê nûrê dînêrîn. Adem pirsî got: ‘’ew çima têne pişta min?’’ Xwedê bersiv da got: ‘’Ew li wê nûra Muhammed dinêrin ji bo wê têne pêş. Adem xwest ku ew nûr were pêşîya wî, xwedê jî qebûl kir û danî pêş. Dîsa Adem dipirse: ‘’ ma ji wê Nûrê heye ? Xwedê dibêje çare yare wê heye ew jî yê eshabê resûl, xelîfeyê raşidîn. Adem dixwaze ku wan dêne ser laşê wî xwedê jî wan nûra di dane ser tilîyên wî.

Xwedê ji Adem û Hewa re destûr da ku li bihûştê bigerin, gorî dilê xwe çi bixwazin jê bixwin lê ji bilî wê dara genim ku jê ne xwin

Go tu û hewa herin nav cinetê

Her du serbestin li keyf û lezzetê

Her tiştê go hûn bixwazin jê bixwin

Xeynî vê dara genim hûn jê nexwin[18]

Heyderî wusa didomine, dibêje: Şeytan xwest ku wan ji bihûştê derbixe. Çû ew xapandin û ji wê dara genim xwarin her dû mana tazî û ji bihûştê hatin avetin wexta Adem ji

[17] Heyderî, Mewlûda Nebi s.7

[18] Heyderî, Mewlûda Nebi s.10

bihûştê derket li ser derîyê bihûştê dît ku navê Muhammed di bin navê xwedê re hatiye nivisandin.

Wî jî fehmkir ku Muhammed li bâ xwedê kesekî giring e û bi navê wî ‘efû kirin ji Xwedê xwest û tobe kir, xwedê jî ji bo xatirê navê wî adem ‘efû kir u tobe ya wî qebûl kir.

Wî Muhammed daye ber xwe tobe kir

Heq teala derîyê tobê lê vekir

Hatî cibrîlê emîn gote Adem bâ usûl

Tobeyate ji bo Muhammed bû qebû l[19]

**Beşa pêncem: Nêsebê pêxember, elametên Ebdillah, Bergeryana cihûyan dê Ebdullah bikûjin, Bûna Ebdullah û zewaca ebdillah:**

Beşa di mewlûdê de herî dirêj eve ji 83 beytan pêk tê. Di vê beşê de behsa çend mijara hatiye kirin. Heyderî ev mijar ji hev neveqetandîye, di nav hev de nivîsandine. Emê van mijaran yek bi yek rawe bikin

a) **Nesebê pêxember:** Heyderî di vir de behsa bav û ecdadê pêxember kiriye. Dibêje hemû bavên wî cinetîne, ‘esîlin û pakijin. Ji gunehan dûrin. Heyderî yek bi yek navê 21 bavên wî dide û intîkala nûra Muhammedî bi vî şiklî rêz dike. Ji Adem dest pê dike heta bavê wî Ebdillah didomîne.

Bav û ecdadê Muhammed ta bi jor

Cinetîne merd û mîr xas û cesûr

Silsila wî tev ‘esîlin fâxîrin

Dê û bavê wî temîz in tahir in[20]

b) **Elamatên Ebdillah:** Piştî ku Heyderî nesebê pêxember dawî dike û nûra muhammed herî dawî bi Ebdillah re dimîne behsa hin bûyerên ku Ebdillah dîtine dike. Di vir de Ebdillah ji bavê xwe re behsa van bûyeran dike, ji bavê xwe re dibêje dema ez diçim çolê ji pişta min nûrek mezin derdikeve û diçe asîman dibe du şeq yek diçe şerqê yek jî

[19] Heyderî, Mewlûda Nebi s.12
[20] Heyderî, Mewlûda Nebi s.12

diçe xerbê dîsa ev nûr digihîjin hevdu û dengek ji xeybê tê dibêje: ‘’Nûra Ehmed bi te re ye’’ û disa dara hişk ku li bin dirûnim şîn dibe bavê wî jî piştî van gotina mizgînîya pêxemberê dawî dide ku ew ji toxmê wî be.

c) **Bûna Ebdillah:** Heyderî dibêje dema ku Ebdillah çêbû cihûyan fehm kirin ku bavê Muhammed çêbûya ji ber vê jî tirs kete dilê wan loma ku Muhammed hat wê hikmê wan betal bê û dewra wan ê girtin. Cihûya ji hin nîşanan fehm kirin ku Ebdullah çêbûya, Yahya pêxember dema ku hatiye kuştin xwina wî li ser cibeyê wî maye û pê ve hişk bûye bawerîya cihûyan de wexta ku ev xwin dîsê rehin bû ew tê wateya ku bavê pêxemberê dawî jidayik bûye. Ew xwin rehin bu û cihû ketin fikrê pêşeroja xwe de

ç) **Bergeryana cihûyan dê Ebdullah bikûjin:** Wextê ku cihûyan dît ev nîşan pêk hat sond xwarin ku Ebdullah bikujin ji bo vê yekê jî hatin Mekeyê li ber geran ku demekê Ebdullah tenê de wî bikujin, defk û dolab lê vedan. Heyderî berdewame ji Wehbe bavê Âminê neqil dike dibêje dema ku Ebdullah rojekê çibû nêçîrê bi tena xwe wehb jî li çolê nêçîre bû . 70 cihûyan êrîşê Ebdullah kirin lê ji asimanan melek hatin xwearê û ew parastin.

Ew hicûma wek gurê ku bêne pez

Wî bi çava dî beledîtî bilez

Eskere xeybê ji jor de hatine xwar

Ew cihû kirin helak û tar û mar[21]

**f) Zewaca Ebdilah:** Dema Wehb vê bûyerê dibîne heskirina Ebdilah dikeve dilê wî û ji malbata xwe re behsa vê bûyerê dike, ji hevjina xwe re dibêje zû here bêje Ebdumuttalibê bavê Ebdilah ger qebûl bikin ez ê Âminê bidim wî

Gote jina xwe re zû here edeb

Bêje Ebdulmuttalib şêxê ereb

[21] Heyderî, Mewlûda Nebi s.16

Ku ji Ebdullah re bênin yek jine

Nîne mislê Âmine dewra dine[22]

Diçin Âmine dixwazin ji Ebdullah re dawetek xweş û têr xwarin çêdikin. Heyderî dibêje wê şevê ji qehra evîna Ebdullah sed keçikê Mekeyê mirin. Şeva ku zewicîn pût qulipîn û şeytan li ser rûyê xwe meşîya çûye li ser çîyayê Ebû Qubeys bang kiriye, şeytanê dî jê pirisine ku ji bo çi ew diqîrîne. Wî jî gotîye îro Muhammed ketîye betnê Âmine û dewra pût u senêman paş de maye.

**Beşa Şeşem: Wefata Ebdillah:** Di vê beşê de Heyderî behsa wefata Ebdullah dike. Piştî ku Âmine bi Muhammed heml dibe Ebdullah ji bo tîcaretê diçê Şame. Ebdullah 25 sali bû di vegera Şamê de ew nexweş dikeve û ku digihîje Medineyê nexweşiya wî lê dijwar dike, li Medîneyê diçê ser dilovanîya xwe.

Çû ye Şamê hat Medine ah û ah

Go wefat bû hate ser emrê îlah[23]

Bihîstina wefata Ebdullah şînê dixe nav Mekkeyê , qehreke mezin dikeve nav malbata wî taybetî jî ya Âminê

Hem bihistî Âmine bû dil birin

Dagirî û dar ber pê re girin[24]

**Beşa hevtem: Bûyera di hemla Âminê de û Bûna Pexember:**

Heyderî di vir de behsa du mijaran dike:

a) **Bûyerên di hemla Âminê de:** Heyderî di vê beşê de behsa hin xewnê ku Âminê di her mehê hemla xwe de dîtine dike. Âmine di her mehê hemla xwe de pêxemberek dîtîye ku mizgînîya Muhammed didayê ev pêxember bi rêzê wusa ne: Adem, Şît, İdris, Nûh, Hûd, Birahim, Simail, Mûsa u îsa pêxember.

b) **Bûna pêxember:** Li gorî ku Heyderî dibêje dema bûna pêxember de Âmine li malê tenê bû tirs kete dile wê ku wê çawa bike. Lê xwedê ew tenê nehişt û çar pîrek şandine cem, ev pîrek Hewa, Sara, Asiye û Meryem bûn wê şevê ronahiyek tê holê ku bajarê

[22] Heyderî, Mewlûda Nebi s.16
[23] Heyderî, Mewlûda Nebi s.20
[24] Heyderî, Mewlûda Nebi s.20

Şam û Basra yê pê ronî dibin. Xwedê emir dike cibraîl ku mizgînîyê bide xelkê erd û asimana. Wê şevê melek kom bi kom hatin ser rûyê Mekeyê. Âmine dibêje wê demê ez tî bûm, şerbetekê wek şîr sipî û wek hingiv şêrîn dane min, min vexwar. Dîse Heyderî dibêje dema ku pêxember çê bû sinetkirî û paqij bû

**Beşa heştem: Merheba:**

Mewlûda Heyderî bi vê beşê tê qedandin, yanî bi bûna pêxember mewlûd jî dawî dibe. Vê beşê her çiqas bi nav kirine em bêjin ''Merheba'' jî ev peyv di beyta yekemde tenê derbas dibe ya rast gelemperî serê beytan bi peyva ''hat'' dest pê dike.

Hat Muhammed merheba û sed merheba

Hat Muhammed bû şefî'ê muznîba[25]

ev beş keyfxweşîya bi hatina pexember tîne ziman û pesnê pêxember tê de tê gotin

**Beşa nehem: Pesnê Pêxember:**

Di vê beşê de pesin dana pêxember tê kirin. Hin sifatên pêxember têne ziman û dîsa şefaatê jê dixwaze, em dikarin vê beşê wekî paşgotinê jî bibînin ji ber ku xalas kirina mewlûdê di vir de tê ziman û beyta herî dawî de ji bo pêxember, malbat û hevalên wî , niviskar û haziran re fatîha dixwaze. Di vê beşê de Mela Muhammed Emîn mexlasa xwe ya Heyderî jî bi kar tîne.

Bo Muhammed âl û eshabên wî

Bo rûhê etba' û ehbabê wî

Ê ku te'lif kirine mewlûdê ey bira

Bo feqirê Heyderî û him hazira

Hûn bixwînin fatihe ser van temam

Ser Muhammed esselat û vesselam[26]

---

[25] Heyderî, Mewlûda Nebi s.25

[26] Heyderî, Mewlûda Nebi s.29

## 3.2 ZIMANÊ MEWLÛDÊ

Mela Muhammed Eminê Heyderî her çiqas ji aliyê naverokê ve ji mewlûda yekem kurdî mewlûda Batêyî sûd girtibê jî ji aliyê ziman ve ji mewlûda Batêyî cûda dibe. Zimanê mewlûda Heyderî bêhtir zelal, xwerû û hêsan e. Berhemên ku dikevin edebiyata Îslamî de gelek peyvên erebî û farisî dihewînin. Mewlûd jî berhemek edebîyata Îslamîye, loma bandora van zimanan li ser mewlûdê jî heye. Dema ku berhemên olî tên nivîsandin têgehên Îslamî jî mecbûr tên bi kar anin. Gelek nivîskar van têgehan wek eslê xwe bi zimanê erebî dinivîsin û hin nivîskar ji van têgehan wergerî zimanê xwe dikin û dinivîsin. Ev têgeh ji aliyê gel ve gelek caran nayên zanîn loma dema ku dixwînin fehm nakin bêguman ev di mewlûda Heyderî de jî hene lê gelek hindikin. Heyderî mewlûda xwe ji bo gel fehm bike nivîsandiye ev jî dike ku zimanê wî li gori gel be yani hêsan be. Di nav kurdan de Mewlûda Bateyî gelek giring e lê ji ber ku hinekî nayê fehm kirin mewlûda Heyderî di nav gel de bi mewlûda bateyi re bêhtir ew tê tercîh kirin[27]

Wekî me li jor jî goti bû her çiqas mewlûda Heyderî bi kurdîya kurmancî hatibe nivîsandin jî bandora zimanê erebî kêm be jî tê de heye. Lê ku gelemperî em lê binêrin peyvên bîyanî li gorî kurmancî geleki kêmin. Peyv û gotinên kurdî yên resen bi awayekî rewan di berhemê de hatine bikaranîn. Ji bo ku zimanê kurdî di mewlûdê de çawa hatiye bikaranîn û zelalbûna wê bê dîtin mirov dikare gelek hevokan mînak nîşan bide, lê me ev beyt dan;

Her tiştê ku hûn dixwazin jê bixwin
Xeyrî vevê dara genim hûn jê nexwin

Ew di nava cinetê de man gelek
Di ji piştê vê tên têmaşa wî melek

Gotî ya reb ew ji bo çi têne paş
Go li wê nûra Muhammed mane şâş[28]

Di vê beytê de wekî ku tê dîtin hemû peyv bi kurdî ne û her kurd van beytan dema ku bixwîne rehetî wê fehm bike

[27] Tıraşçı, Güneydoğu Ve Doğu Anadolu Çevresinde Arapça, Kürtçe, Zazaca Mevlidler ve Müzikal Olarak İcra ediliş Tarzları, s.216
[28] Heyderî, Mewlûda Nebi, s.10

Her çiqas kêm jî be peyvên erebî jî di mewlûdê de derbas dibin dîsa em bêjin ev ne tiştekî ecêbe ji ber ku Îslam di nav ereban de, bi destê pêxemberekî ereb ava bûye û berhemên ku dikevin bin banê edebîyata Îslamî de mecbûr peyvên erebî tên bikar anin. Heger zimanên pêxember elmanî ba teqez gelên misilman wê peyvên elmanî di jîyana xwe de bi kar aniba. Kurtasî em derheqê vê mijara xwe de ji Mewlûda Heyderî dikarin van beytan mînak bidin.

Fî sebîlîllahî şehîd û xaziya

Haciyullahî cemîul ewliya

Ya şemî û ya mucîbû da'wat

Ya Cemîlê sebrî 'inde xasarat[29]

wekî ku tê dîtin ev peyv bi erebîne û kesekî ku bingehinê wi ya erebî-olî tune be van beytan fehm nake.

ji bilî zimanê erebî çend peyvên farisî jî di mewlûdê de derbas dibe Mînak:

Çend meh û roja li ber danin kemin

Kengi wi bi der wî bikin parçe yekin[30]

Duwazdehê heyva Rebiul ewwel

Amînê go mam tene der menzil[31]

ev herdu beytên jor yê bin xetkirî peyvên farisîn ''kemin'' tê wateya Dek, xefike, ''der menzil ji tê wateya xanî, malê…

**3.3 Uslûba Mewlûdê**

Uslûb peyveke erebî ye û meneya wê vegotin, îfade, tarz û rêbaza kirinê ye.(TDK sözlükleri) Ji hêla edebî ve jî taybetmendiya vegotin û nivîsandina kesekî ye. Bi hevokan, bi şiklê nivîsandinê, bi peyv û gotinên hatine bikaranîn, bi metoda nivîsandinê, metafor, sembol, maxlas û tiştên bi vî rengî ve şêwaza nivîskar nîşan dide. Wek neynikekî xususiyetên wî yên nivîsandinê, şopên kesayetiya wî, binhişê wî, alema wî ya hundirîn, ziman, hest, hiş û ramanên

[29] Heyderî, Mewlûda Nebi, s.29
[30] Heyderî, *Mewlûda Nebi*, s.15
[31] Heyderî, *Mewlûda Nebi*, s.22

wî dide der. Yên ku berhemekê dixwînin ji ber van xusiyetan texmîn dikin nivîskarê wê berhemê kî ye, ew berhem kingê hatiye nivîsandin, nivîskar girêdayî kîjan ekolê ye û h.w.d[32] Him di edebiyata klasik de him jî ya modern de her helbestvan û nivîskar xwedî uslûbekê ye li gori vê uslûba xwe dinivîse ber û berhemên xwe pêşkeşî xwinerê xwe dike em ê niha hinekî behsa uslûb ango şêwaza Heyderî bikin ka wî mewlûda xwe çi uslûbê nivîsandîye.

Di mewlûda Heyderî de beytên ewil bi hemdê xwedê dest pê dikin

Em bidin hemdê xwedê ey misliman

Daye me pêxemberê axir zeman[33]

Mewlûd bi xwastina fatîhayê dawî dibe. Her du beytên dawi evin

Ê ku te'lif kirîye mewlûd ey bira

Bo feqîrê Heyderî û hem hazira

Hun bixwînin fatiha ser van temam

Ser Muhammed esselatu vesselam[34]

Derbasbûna beşan jî bi van beytan pêk tê

Hun ji eşqa dil bibêjin ber dewam

Ser Muhammed esselatu vesselam[35]

Di mewlûdê de ayet, hadîs hunerên edebî, taswîr, sembol û hwd gelek tiştê din yên edebî hatine bikaranîn. Ev tişt jî naşî me dikê ku Heyderî mewlûda xwe bi çi metodê nivîsandiye. Pêşî em dikarin bêjin ku metoda Heyderî dîdaktîke (tiştê ku agahî dide, hîn dike) ev metod xwendina wê u jiberkirina wê  hêsan dike em ê niha yek bi yek uslûba Heyderî binirxînin.

---

32 Tosun*, Usl'uba Pesnê Pêxember di Mewlûda Yekem a Kurdî de,* s.1515
33 Heyderî, *Mewlûda Nebi,* s.2
34 Heyderî, Mewlûda Nebi, s.29
35 Heyderî, Mewlûda Nebi, s.3

### 3.1.1 Bikaranîna ayet, hedîs û riwayetên olî

Heyderî alimekî Îslamê yê melatî, muderîsî û şêxîtî kiriye. Ji aliyê zanistên Îslamî ve tije ye kesekî pir girîng e. Di ‘ilmê tesewuf, fikih û tefsîrê de pir peşketiye. Dema ku zanayekî wekî Heyderî berhemekê dinivîse ji wê zanabûna xwe îstîfade dikin. Alimê Îslamê gelemperî çavkanîyê xwe ji quran, hedîs, çîrokên dînî-tesewufî û meseleyên hilbijartî distênin. Heyderî jî di mewlûda xwe de carna ayet carna hedîs û carna jî ji rîwayetên dînî sûd girtiye. Ev jî di nav mewlûdê de şêwazeke.

Em dikarin van beytên jêr ji bo bikaranîna ayêtên  di mewlûdê da  mînak bidin

Go tu û hewa herin nav cinetê

Her du serbestin li keyf û lezzetê

Her tiştê ku hun dixazin jê bixwin

Xeyrî wê dara genim hun jê nexwin[36]

ev beytê jor naşî me dide ku Heyderî ev ji ayetên Quranê sûd girtiye. Di surêya Beqere ayetên 35. de  bi vî şiklî mesele tê gotin. ‘’Me got: “Hey Adem! Tu û hevsera xwe (Hewa), li bihiştê bicih bibin. Çawa dilê we bixwaze wisa bi noşîcan ji xweşiyên wê bixwin û xwe nêzî vê dara ha mekin, vêca (eger hûn nêzî wê bibin) hûn ê bibin ji zaliman”.[37]

Dîsa ku pêxember bi îşaretekê tilîya xwe heyv xistiye du qet ji bo bikaranîna ayetan dibe minak beyt wusaye:

Lew ji nûra te şeva reş û şefeq

Yek Îşaret go te daye, heyv bû du şeq[38]

Ev beyt sûreya Qamerê têne bîra mirov loma di sûreyê de tê gotin ku heyv bûye du şeq. Em dikarin bi rehetî bêjin ev beyt jî ji quranê hatine girtin

ji bo bikaranîna hedîsan jî di mewlûdê de mînak hene Heyderî di mewlûdê de carna dibêje “rîwayet ji muhammed hatiya’’ carna jî dibêje ‘’ibnî Ebas rîvayet kiriye, ji  bo mînak em dikarin van beytan bidin.

---

36 Heyderî, Mewlûda Nebi, s.10
37 Quran, Bakara 2/35
38 Heyderî, Mewlûda Nebi, s.27

Nefsî nefsî ku ketîya nav alem

Tu şefaatkî ji bo me wê dem[39]

ev peyva "nefsî nefsî " behsa roja qiyametê dike, wê rojê her kes bi tena serê xwe dimîne û dikeve derdê xwe. Pêxemberê me jî wê rojê di nav vê rewşê de ji bona umeta xwe dikeve endîşê û ji bo 'efû kirina wan secde dike, dibêje: "umeti umeti" ev hedîseke di sahîha bixarî de derbas dibe ye. Tê dîtin ku Heyderî hêdîs bi vî rengi bikaranîye.[40]

### 3.3.2 Hûnerên edebî yên mewlûdê

**Teşbîh:**

Teşbîh ev hunere ku tiştekî dişibîne tiştekî dîn. peyveke erebîye, ji bo vegotinê xurt bike tê bikaranîn.[41]Heyderî di mewlûdê de ji bo pesin û wesfên Hz. Pêxember bi kar bîne gelek hûnerên edebî bikaranîne, teşbîh jî ji wan yek e. Bi vê rêbazê ve wate xurt dibe û tahmeke edebî derdikeve holê.

Mesneda vê umetê her tu yî

Deryê fetha cineta me her tu yî[42]

Bu wekî dura sipî pir şuxlê da

Çû sucûdê hem kirî hemdê xweda[43]

**Îştîqaq**

Wek têgeheke edebî peyvên ku ji heman reh û bingehê tên di hevok an jî beytekî de li cem hevdu bikaranîn e. Ji bo ku mene û deng xurt bibe, vegotineke biaheng derkeve holê tê bikaranîn[44]

Ey Muhammed ey şefi'e umetê

Hadi û mehdî hebîbê izzetê[45]

---

39 Heyderî, Mewlûda Nebi, s.28

40 Buxari, Camius sahih, Enbiya, 3

41 Kadri Yıldırım, Mem û Zin Çeviri ve Kavramsal Tahlili, avesta, 2010, İstanbul, s.61

42 Heyderî, Mewlûda Nebi, s.3

43 Heyderî, Mewlûda Nebi, s.7

44 Yıldırım, Mem û Zin Çeviri ve Kavramsal Tahlili, s.54

45 Heyderî, Mewlûda Nebi, s.2

**Nîda**

Nîdayê de helbestvan bi vegotineke coş dest bi helbesta xwe dike û bi dengekî gazî îfadeya xwe didomîne. Nîda ji bo gazîkirin û bangkirina kesekî an jî tiştekî tê bikaranîn. Hest û kelecana xurt bi saya nîdayê tê vegotin û gelemperî baneşanên hêy, ey, ax, wax, eywax, lo, lê nîşaneyên nîdayê ne

Ey Muhammed ey resûlê ins û cin

Xwedî yê tac û beyreqa roja mezin[46]

Di vê mînaka li jor hatiye dayîn de baneşîna EY nîda ye. Ev jî li hember muxatabê xwe kelecanê nîşan dide û gotinê xurt dike.

**Îstifhâm**

İstifham tê wateya pirskirinê. Ji bo ku balê li ser gotinekê û tiştekî bikşîne, fikir û ramanan fêm bike pirs pirskirin e.[47]Gelemperî pirsên wek "kîjan, çi, kî, çima" tên pirsîn. Heyderî di vê beyta mewlûdê de dibêje;

Lê qelem gotê xwedane 'izzetê

Ez **çi** deynim der heqê vê umetê?

**Têzad**

Peyva tezadê peyveke erebî ye. Meneya wê dijbûn e, dijberî û nakokî ye. Ji hêla edebîyatê ve peyvên ku dijî hev in di vegotinê de bi hev re bikaranîn e.

Çûn u hatin rast û çep teyrê belek

Ez di wî hali de tî bû me gelek

Dara hişk rûnim li bin ew şîn dibe

Ku ji bin diçim wekî bere hişk dibe

Wek ku tê zanîn çûn û hatin, rast û çep, hişk û şîn tiştên dijberî hevdu ne, Heyderî di vê beytê de peyvên "rast" û "çep" bi kar anîye û hunera tezadê derxistiye pêş.

[46] Heyderî, Mewlûda Nebi, s.3
[47] Yıldırım, Mem û Zin Çeviri ve Kavramsal Tahlili, s.55

**Îqtîbas**

Wek têgeheke edebî parçeyek ji Qur'anê an jî hedîsekê tam an jî hinekî jê bigrin û helbestkî an jî pexşankî di nav hevokê de bikarbînin re tê gotin

Lê xwedê got e qelem ger ew neba

Erd û esman felek wê yek neba

Dîn ku xwina tir ji cibe hate xwar

Rahiba go hey hawar û sed hawar

Ev hevokên bin xetkirî ya yekem hedîsekê hatiye sitandin. ya duyem jî gotineke rahiba tê de hatiye gotin. Ev jî hunera İqtibasê şanî me dide

**Telmih**

Telmîh bi meneya xwe ya ferhengê "çirseçirsk biriqandin" e. Lê wek têgeh di îfadeyê de bi rêya temsîlê îşaretê bûyer, çîrok, ayet, hedîs baweriyên cuda û h.w.d kirin e.[48] Yanê tişta ku dixwaze bê gotin şûna rasterast gotinê bi awayekî sergirtî û bi îma, temsîl û işaretan yanê tiştên din ve vegotin e Heyderî haya wî ji ilmê îslamî heye û vê ilmê xwe di nav beytên xwe de cih dike. Mînak dema di vê beyta jêrê de behsa bûyereke ku hatiye serê Yehya pêxember dike Ev bûyera ku Heyderî behsa wê dike di hemû dînên semawî de tê zanîn, ji ber vê Heyderî ji şehîd bûn û cîhê şehadeta wî bi rehetî dinivîse.

Go nebî Yehya şehîd bû ye li şam

Cibeyê xwîn pêve hilandin bû elem

**İstîare**

îstîare ji wê hûnera ku peyvekê bi mebesta şibandinê derveyê wateya xwe de bi vegotineke metaforîk bê bikaranîn re tê gotin.[49]

'eskere xeyb ji jor de hatine xwar

Ew cihû kirin helak tar û mar

---

48 Yıldırım, Mem û Zin Çeviri ve Kavramsal Tahlili, s.57

49 Yıldırım, Mem û Zin Çeviri ve Kavramsal Tahlili, s.62

Di vê beytê de îfadêya “eskere xeyb” Ji ber ku tê wateya milyaketan, hûnera istiare pêşkeşî me dike

**Tenasub**

Ew hunera ku bi kêmî ve du peyv, têgeh û biwêjên têkildar bêyî ku wateyek duyemîn destnîşan bike re tenasüb tê gotin.[50]

Ya ilahî ya xafûru ya helîm

Ya letîf û ya kerîm û ya rehîm

vê beytê de ev navê bin xetkirî hemû navê xwedê ne bi vî awayî tekilî navbera wan de heye lê tu wateya dî jê dernakeve Jİ bo wê jî di vir de hûnera tenasub ê heye

**Mubalağa**

Ji hunera mezinkirina tiştekî yan bûyerekê re tê gotin. Di vê hunerê de tiştekî yan jî bûyerekê ji rastiyê derdixe û zêdeyî wê mezin dike.[51]

Go ji Adem bû heta dinya hebe

Her serî însanek sêsad dev hebe

Her devkî hebin sêzdeh ziman

Wesfê husna te bibêjin her zeman

Hin pere masrûf kirî ber mewlûdê

Wek çîyakî zêr di xêrê de dide

**Tekrîr**

Ji bo xurtkirina wateyê, beytekê an jî proseyekê de dubarekirina heman peyvane.

Hat muhammed ser sera û çava re hat

Hat muhammed roja îmanê hilat

[50] Yıldırım, Mem û Zin Çeviri ve Kavramsal Tahlili, s.58

[51] Yıldırım, Mem û Zin Çeviri ve Kavramsal Tahlili, s.59

**Cotpeyv**

Di peysaziyê de heke du peyvên ji hêla mene an jî deng ve dişibin hev, du peyvên wek hevdu yan jî du peyvên li dijî hevdu dema li dû hev bên rêzkirin peyveke nû ya ku meneya wê cuda derdikeve holê û ji vê re dibêjin cotpeyv. Hin caran du navdêr, hin caran du rengdêr, hin caran du hoker û hin caran jî du lêker dibin cotpeyv û peyveke nû derdixin holê. Gelemperî du peyv ji bo cotpeyvê tên bikaranîn. Hin caran ji du peyvan zêdetir peyv jî dikarin bibin cotpeyv. Armanca cotpeyvan ewe ku hêza vegotinê xurt û dewlemend bibe, di vegotinê de ahengek derkeve holê.[52] Di mewlûdê de ji bo cotpeyvan gelek mînak hene ku ji van hinek ev peyv in; pak û temîz, behr û ber, bejn û bal, roj û şev, xeml û husn…

Pir qureyşî û ereb hatin bi dengek

<u>Xeml û husna</u> Âmine bu reng e reng

<u>Bejn û bala</u> wan bilind xweş fesal

wek jinê haşimîyan naz û delal

**Qafiye**

Bi erebî "qafiye", bi frensizî "rime" bi îngilizî jî "rhyme" di helbest û stranan de yek ji hêmana ahengê ye ku hêza wê berhemê xurt dike. Bi saya qafiyeyê ew helbest tesîrê zêdetir li ser gotinê dike. Qafiye di dawiya risteyên helbestan de tîpên ku heman dengî didin û tên dubarekirin in.48 Heke berfireh bê terîfkirin mirov dikare bibêje qafiye; di serî, navîn an jî dawiya risteyan de tîp, peyv an jî dengên ku tên dubarekirin, wek hevdu tên nivîsandin lê meneyên cuda didin re tê gotin. Nîvqafîye, qafiyeya tam, qafîyeya dewlemend û qafîyeya tunç cureyên qafîyeyê ne. Heyderî hema ji serî bigre heta dawiyê mewlûda xwe bi qafiyeyê nivîsandiye, hemû cureyên qafîyeyê bi kar anîye. Şêwaza vegotina wî û qafiyeyên di mewlûdê de derbas dibin dewlemendiya uslûba wî nîşan dide.[53]

**Nîv qafiye:**

Di dawiya risteyan de heke dengek bişibe hevdu jê ra dibêjin nîvqafiye

Ew hucuma wek gur go bibine pe**z**

Wi bi çava di beledi tê bi le**z**

---

[52] Tosun, Usl'uba Pesnê Pêxember di Mewlûda Yekem a Kurdî de, S.1515

[53] Tosun, Usl'uba Pesnê Pêxember di Mewlûda Yekem a Kurdî de, S.1518

Tîpa “z” yê ya di peyvên dawiya risteyan de dişibin hevdu nîvqafiye ne;

**Tam qafiye**:

Di vê cure qafiyeyê de du tîp (yek jê dengar û ya din jî dengdêr) dişibin hevdu û di nav xwe de ahengekê çêdikin

go me îman aniye bi Rebê **azîm**

em mişeref bûne bi kurana **kêrîm**

di van risteyan de tîpên “i” û “m” di nav hev de biqafiye ne.

**Qafiyeya dewlemend:**

Sê an jî zêdetir deng dema dişibin hevdu û bi heman şiklî tên nivîsandin ev wek qafiyeya dewlemend tê binavkirin.

Yek riwayet go ji muhammed ha**tiye**

kedre mewşuda me e ko gir**tiye**

Peyvên “hatiye” û “girtiye” di nav hevdu de bi qafîye ne. Tîpên “t,i, y, e” wek ku tê dîtin di dawiya herdu peyvan de dişibin hevdu. Ji ber ku çar tîp dişibin hevdû ew qafîyeya dewlemend e.

**Qafiyeya Tunç**

Peyveke di dawiya risteyê de derbas dibe heke di nav peyveke dawiya risteyeke din de jî derbas bibe ev deng dişibin hevdu ku jê ra dibêjin qafiyeya tunç. Ev wek cureyeke qafiyeya dewlemend tê qebûlkirin

Heq teala gote edub ey kelem

Heybetê girtî kelem ma der elem

Di dawiya van beytan de peyvên “qelem” û “elem” qafîyeyê derdixin holê. Di risteya ewil de peyva “qelem” hatiye bi kar anîn, di risteya duyem de jî tîpa “q” yê ketiye peyveke nû ya ku gelekî nêzîkî wê “elem” hatiye nivîsandin.

## Encam

Mewlûda ku di nav kurdan de herî zêde tê tercîh kirin piştî mewlûda Bateyî re ya Mela Muhammed Eminê Heyderî ye. Loma berhemeke  giring e. Di mizgeft û medreseyan de piştî Quranê zarok hînê wê bûne û di şîn û şahîya de hatîye xwendin. Heyderî bi zimanêkî zelal mewluda xwe nivîsandîye herî zede cî daye kurmancî û erebî tê de gelek kêm bikaraniye, gel dema ku dixwîne tehma wê bêhtir distîne. Heyderî mewlûda xwe wek bateyî beşên wê serenav nekirîye lê dema tê xwendin mijarên beşa tê fehmkirin.

Mewlûd bi uslûbeke dîdaktîk hatiye nivîsandin, ji ber vê jî zêdetir hatiye xwendin û jiberkirina wê hêsan bûye. Heyderî di mewlûdê de hunerên edebî yên wek îştiqaq, tekrîr, îstifham, nîda, mubalağa, cotpeyv û h.w.d bi kar aniye ku pesnê pêxember bi vî awayî xurttir û geştir bide. Bikaranîna van hunerên edebî helbestvanîya wî nîşanî me dide. Herî dawîn mirov dikare bibêje Heyderî bi mewlûda xwe ya ku him ji hêla ziman, huner û vegotina edebî ve cîhê xwe di nav nivîskarên mewlûdan de rakîriyê astekê bilind.

# ÇAVKANÎ

El Kitabı, Türk-İslam Edebiyatı, Grafiker yayınları, 2016, S.188

Tosun Türkan, Usl'uba Pesnê Pêxember di Mewlûda Yekem a Kurdî de,, e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi, Aralık-2019 Cilt:11 Sayı:3

Eroğlu, Süleyman"Edebî Bir Tür Olarak Mevlitler-Şekil Özelliklerine Göre Bazı Değerlendirmeler", U.Ü. Fen Edebiyat Fakültesi Dergisi

11/18 (2010)

Akçay, Halil Son Dönem Tasavvuf Alimlerinden Muhammed Emin El Heyderi (Hayatı ve Eserleri), Kimlik, Kültür Ve Değişim sürecinde Osmanlîdan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu

6-8 Eylül 2012 Bingöl

Tıraşçı Mehmet, Güneydoğu Ve Doğu Anadolu Çevresinde Arapça, Kürtçe, Zazaca Mevlidler ve Müzikal Olarak İcra ediliş Tarzları C.Ü. İlahiyat Fakültesi Dergisi

2013, Cilt: XVII, Sayı: 2,

Kızıl,Hayreddin Diyarbakı Ve Çevresinde Yazılımış Mevlitlerin Konularına Göre Tasnifi Denemesi, e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi -www.e-sarkiyat.com- ISSN: 1308-9633,

Nisan 2012 Sayı: VII

Heyderî Mela Muhammed Eminê , Mewlûda Nebi, Ayfa Basın,

Yıldırım, Kadri , Mem û Zin Çeviri ve Kavramsal Tahlili,

avesta, 2010, İstanbul,